

*Bi xêr hatine zarokistana
Karljohansvern'ê*



Naverok :

1. Bi xêr hatine!

- 1.1 adres, telefon, email
- 1.2 Cih
- 1.3 Saetên ku zarokistan vekirî ye
- 1.4 Karmend

2. Hevkarî bi dayîk û bavan ra

- 2.1 Qanûna Zarokistanê
- 2.2 Komîteya rawêjkarî û hevahengiyê bi dayîk û bavan ra
- 2.3 Komîteya hevbeş a zarokistanan li Horten'ê(FUB)
- 2.4 Pêwendî û hevkarîyên rojane
- 2.5 Lêkolînên Bikarhêner

3. Veşartîbûn, erka dayîna belgnameya serboriya cezayê û agahiyan

4. Destûrên bo amûrên dijîtal

5. Agahiyên Kirdeyî/pratîkî

- 5.1 Bernameya rojane
- 5.2 Anîn û birina zarokan
- 5.3 Nexweşî û nehatina zarokan
- 5.4 Betlane
- 5.5 Cil û kinc û kel û mel
- 5.6 Cejn girtina rojbûnan
- 5.7 Ragirtina dirav/pereyekî biçûk

6. Hevkariyên bi navend û dezgehên din ra

1. Bi xêr hatine!

“Huset”



Navnîşan: Øvre vei 5B, 3183 Horten

Tangloppa Tel: 40 91 28 84

Sjøstjerna Tel: 40 91 28 85

Krabbelure Tel: 40 91 28 86

Bi arîkarê/a Birêvebir ra pêwendiyê çêbikin:

Mari.ortveit@horten.kommune.no

Tel: 40 91 28 67

“Brua”



Navnîşan: Oregata 1, 3183 Horten

Styrbord Tel: 40 91 28 69

Babord Tel: 40 91 28 68

Skuta Tel: 99 20 42 91

Pêwendî bi Birêvebirê/a ra

Ronny.nesse@horten.kommune.no

Tel: 97 55 03 20

1.2 Cih

Zarokistana Karljohansvern'ê li roja 29'ê meha September'a sala 1998'an deriyê xwe vekir. Sê beşên vê zarokistanê li Øvre vei 5B ("Huset"), û 3 beş jî li Oregata 1 ("Brua") hene. Zarokistana Karljohansvern'ê bi awayekî pîrr xweş li ciyekî xwerdan mêşe, perrav, navenda bajêr û çend kevnarxane wekî cîranên herî nêzîk e. Em dorbera xwe bi awayekî çalak bi kar tînin.

Kom:

Zarokistana me ya şaredariyê ye û zarokên ji 0 hetanî 6 salî dipejirîne.

Komên me yê jêrîn li "Huset"ê ne:

- Krabbelure bo zarokên 1-3 salî
- Tangloppa bo zarokên 2-3 salî
- Sjøstjerna sa zarokên 4-5 salî

Komên me yê jêrîn li "Brua"ê ne:

- Skuta bo zarokên 1-3 salî
- Babord sa zarokên 3-5 salî
- Styrbord bo zarokên 3-5 salî

1.3 Saetên ku zarokistan vekirî ye

- Zarokistana me hemî rojên hefteyê ji saet 06:45'an hetanî 16:30'î vekirî ye. Rojên semî û yekşeman girtî ye.
- Zarokistana me li cejna Krîsmesê ji Krîsmesê hetanî Sala Teze bi qasî du rojan girtî ye.
- Li Cejna Sala Teze, em li 12.00 nîvrojê zarokistanê digirin.
- Li cejna Easter'ê ji duşemiyê hetanî çarşemiyê, jê beriya pêncşemiyê Maundy'ê, zarokistana me girtî ye.
- Li meha July'ê, em bi qasî sê hefteyan zarokistanê digirin.

1.4 Karmend

Li zarokistanê Birêvebirek û arîkarekî/a birêvebiriye hene ku her du jî mamostayên şareza yê pêç-dibistanê ne. Ji bilî van, ji her komê ra sê

karmendên me hene. Li her komê, serokê perwedeyê heye û yên din jî kesên pispor û arîkar in.

1.5 Rojên bernamedanînê

Her salê bo dersan, perwerdeya pêvek û bernamedanînê pênc rojên danîna bernameyan hene. Li wan pênc rojên bernamedanînê, zarokistan girtî ye. Rojên bernamedanînê bi dibistanan û heya radeya ku mimkin be bi SFO'yê ra tên birêxistin û hevahengkirin. Di nivîsîna bernameya her salê dan rojên bernamedanînê diyar dibin.

2. Hevkarî bi dayîk û bavan ra

2.1 Qanûna Zarokistanê

Kopiyek ji qanûn û rêzîknameyên Şaredariya Horten'ê bo zarokistanan ê ji hem dayîk û bavan ra were şandin. Belgeyên jêrîn li destên Birêvebir da hene ku li Zarokistanê birêxistina zarokistanê pêkan û mimkin dike:

- Qanûna Zarokistanê bi rêzîknameyên berbiçav
- Bernameya Çarçoveyê bo zarokistanan

Hûn dikarin ji birêvebir daxwaz bikin ku van belgeyan bide we.

Beşa 1. a Qanûna Zarokistanan dibêje ku “ zarokistan, bi hevkarî û têgihîştina baş a malbatê, yê hewl bide sa ku pêdiviyên zarokê bo parastinê û lîstinê pêk werin, her wiha hînbûn û perwerdeyê wekî bingeha geşepêdana giştalî xurt bike. Zarokistan ê ser bingeha nîrxên sereke li mîrat û kevneşopiya xiristiyaniyê û mirovahiyê, yên wekî rêz û hîrmet bo mezinahî û sirûştî mirov, azadiya ronakbîriyê, qencî, baxişandin, beramberî û hevgerî û hemî wan nîrxan be ku di dîn, bawer û olên din da jî her wiha rîşeya wan li maf û hqeê mirov da jî heye”.

Li gorî beşa 2. a Qanûna Zarokistanan, wezaretxane bernameyeka çarçoveyekê bo zarokan diyar dike. Ev bernameya çarçoveyê bo erk û naveroka karên zarokistanan rêzîkan diyar dike. Ev bernameya çarçoveyê dibêje zarokistan ji nava gellek tiştan dê:

- Agahiyên ser warên sereke û girîng bide zarokan
- Ji şopgerbûna xwezayî, afirînkarî û tîniyê zanebûnê ya zarokan piştevaniyê bike
- Li gorî hezkirina zarokan, agahî, şarezatî û şiyana wan çalakiyan pêk bînin.

2.2 Komîteya rawêjkarî û hevahengiyê bi dayîk û bavan ra

Her zarokistan, ji bo ku bi baştirîn awayê mimkin û pêkan bi malbatên zarokan ra hevkarî hebe, dê xwedana komîteyeka rawêjkarî û hevahengiya bi dayîk û bavan ra be. Bingeha hevkarî û bandor û hîkariya dayîk û bavan li zarokistanan li beşên 1, 2, 4 û 15 ên Qanûna Zarokistanan hatiye nivîsîn.

Erka Komîteya Dayîk û Bavan ew e ku tiştên bi dilê dê û bavan bi pêş ve bîne û wê wekî arîkarî bide hevkarîya nava zarokistanê û bi vî awayî dê û bav derdoreka baş bo zarokistanê amade dikin. Komîteya Dayîk û Bavan ê were agahdarkirin û ew maf û heqê wê jî yê hebe ku li bara wan pirsan nêrîna xwe bibêje ku sa pêwendîya nava dê û bavan û zarokistanê girîng e.

Ev Komîteya Hevahengiyê dê wekî koma rawêjkar, çêkirina têkiliyan û hevahengiyê kar bike. Rawêjkariya Dê û Bavan û karmend ê bo Komîteya Hevahengiyê ya Zarokistanê nûnerinan hilbijêrin.

2.3 Komîteya hevbeş a zarokistanan li Horten'ê(FUB)

Komîteya Hevbeş a Zarokistanan li Horten'ê(FUB)li bihara sala 2014'an hat damezirandin û komeka serbixwe bo û digel dayîk û bavan û serperestan e ku li zarokistanan li Horten'ê zarokên wan hene.Armanca vê komîteyê ew e ku hezkirinên dayîk û bavan û yên zarokan li pirsên têkildarî zarokistanan li şaredariyê biparêzin û bergiriyê bikin her wiha ew ê bo hevkarî, gotûbêj û axaftina digel dê û bavan û serperestan , zarokistanan, rayedarên zarokistanan, siyasetmedaran li şaredariya Horten'ê bibe wareka fermî. Bo agahiyên pirtir li bara FUB'yê li <http://www.fubhg.no/> û li bara FUB Horten'ê jî li <https://www.facebook.com/fubhorten/> binêrin.

2.4 Pêwendî û hevkarîyên rojane

Di dirêjahiya salê da, yê girîngiyê bidin civînên fermî û nerfermî yên dayîk û bavan û xalên jêrîn ê tê da hebin:

- Hevdîtinên dayîk û bavan
- Xeberdan û axaftinên ferdî bi dayîk û bavan ra. Zarokistan her salê herî kêr du car axaftinên ferdî nava dayîk û bavan da raber dike.
- Pêwendiyên rojane di dema anîna yan jî birina zarokan da

- Karên cûr bi cûr li zarokistanê.

2.5 Lêkolînên Bikarhêner

Bi awayekî bi rêk û pêk lêkolînên bikarhêneran pêk tên. Ji hemî dayîk û bavên ku li zarokistanên Horten'ê zarokên wan hene ra pirsname tên şandin. Piştî tijîkirina pirsnameyan, em gazî Komîteya Karkirinê ya Rawêjkariya Dayîk û Bavan dikin sa ku encaman vebînin, tiştên diyarbûyî bikin ber nîqaşan û eger pêwsît e, em gerek çî karan bikin.

3. Veşartîbûn, erka dayîna belgeyên serboriya cezayê û agahiyan

Beşa 13 a Qanûna Birêvebirina Giştî li bara veşartîbûnê xalên jêrîn dibêje: “Erka ser milên hemî wan kesan e ku xizmetekê pêşkêş dikin, yan bo wî/wê kar tê kirin, navendeka birêvebirinê ye ku nehêle di dirêjahiya erkdariya wî/wê da li bara karbarên ferdî yê kesekî/ê, kesên din destên wan bigihîje her cure agahî û pirsên ku qala qan jê ra hatiye kirin, yan jê agahdar e”. Hemî karmendên li zarokistanê, xwendekar, şagirtên dibistanê û kesên ku bi zarokan ra kar dikin gerek beriya destpêkirina kar bi me ra, belgeya parastina nihênî û veşartî ragirina agahiyan îmze û wajo bikin.

Beşên 21 û 22 yê Qanûna Zarokistanan qala erka zarokistanê dike ku bo Beşa Xizmetên Civakî û Beşa Xizmetên Rihetiya Zarokan agahiyan pêk bînin. Karmendên zarokistanê erkdar in ku her agahiyên ku ku rege bikaribe rewşên negîranyê çêbike yan pêkanîna kiryanan pêwîst bike, rabigihînin. Zarokistan di pîrraniya rewşan da, yê ji pêş da, dayîk û bavên zarokan ji vê negîranyê agahdar bike. Zarokistan xêncî erka xwe ya pêkanîna agahiyan, her wiha erkdar e ku ji bo Beşa Xizmetên Civakî û Beşa Xizmetên Rihetiya Zarokan, li ser daxwaza van beşan, amade bike. Ev erka pêdivî li beşên 8-5 ên Qanûna li bara Beşa Xizmetên Civakî û li beşa 6-4 a Qanûna li bara Xizmetên Rihetiya Zarokan diyar bûye.

Beşa 19. a Qanûna Zarokistanan ji hemî kesên karmend li zarokistanan dixwaze beriya destpêkirina karên xwe belgeya rezamendane ji serboriya xwe raber bikin. Şaredarî jî dikare ji kesên ku bi rêk û pêk serdanê dikin û gellek caran li zarokistanê ne, daxwaz bike ku belgeya serboriya xwe rapeşbikin.

4. Destûrên bo amûrên dijîtal

Wêneyên/fotografên ku em li zarokistanê digirin ê bo armancên taybet bin. Li nava wêneyên ku dayîk û bav li ciyekî taybet tînin girtin û wêneyên ku em li qada giştî yanê li zarokistanê digirin da cudahî heye.

Em gerek ji wan wêneyên ku zarokan bi awayekî nebaş nîşan bidin bi dûr bibin. Wêneyên ku li ser Înternetê hatine weşandin anegorî wêneyên ku biryar e bînin çapkirin, kalîte/çawaniya wan kêmtir e. Em beriya ku wêneyan jî xêzekêşan ser Înternetê biweşînin, wan nîşanî dayîk û bav didin û ji dayîk û bav yan jî serperestan iznê dixwazin. Armanc ji weşandina wêneyan li Înternetê çî ye? Em tenê wan wêneyan wedîşînin ku zarok tê da bi hêsanî neyên naskirin.

Wêneyên ku bin çavdêriya zarokistanê tînin girtin nikarin ji bilî malpera zarokistanê li medyayên din da bînin weşandin (wek mînak, li malperên ferdî, Facebook û hwd.). Li Konvansiyona Mafên Zarokan li madeya 16'an hatiye gotin ku em bo nirxandina vê yekê ku kîjan wêneyên zarokan dikarin bînin weşandin an jî daliqandin, berpirs in.

Eger hûn hûngiliyên li bara destûrên me bixwazin, dikarin bi me ra pêwendiyê çêbikin!

Lînk:

Qanûna Mafê Kopîraytê (rûwergirtinê)-Qanûna Cezayê, Beşa 246'an-
Qanûna Daneyên Ferdî, Beşa 11'an.

Clara-Daîreya Parastina Daneyan a Norvêjê-Nivîsoka li bara ICT'yê li zarokistanan.

Nivîsoka Destûrnameyên Daîreya Parastina Daneyan a Norvêjê li bara wêneyên zarokan ser Înternetê.

5. Agahiyên Kirdeyî/pratîkî

5.1 Bernameya rojane

Em li gorî bernameyeka rojane ya diyarbûyî li zarokistanê kar dikin. Ev bername hesta aramî û ewlebûnê bo zarokan da çêdike.

- Zarokistan di saet 6.45'an da vedibe.

- **Taşte** – Zarok dikarin dema ku digihîjin yan dema ku birçî dibin, li aşpêxaneyê/mitbexê da taste bixwin. Zarok dikarin ji malê bi xwe ra xwarinê bînin û zarokistan jî vexwarinê dide wan. Taşte li saet 8.30'yê da kuta dibe.

- **Lîstik û çalakiyên** li hundir û li derve. Em dibin çend koman û dest bi lîstin, pêşnûma/proje û çalakiyan dikin.

- **Civîna** dorbera saet 10.30'yî bo stran, drama, bi dengê bilind xwendin, proje, çalakiyên cûr bi cûr û hwd. e.
- **Firavîn** ji dorbera 11.00'ê. Em idxwazin ku zarok dema xwarinê bi rihetî û bi xweşî tecrube bikin. Em her hefteyê carekê xwarina germ didin û rojên din firavîna sar didin ku wekî sandwîç, vexwarin û sebzeyan in.
- **Lîstik û çalakî** li hundir û derve yan jî dema razan/raketin yan bêhnvedanê bo ew kesên ku piştî firavînê pêdiviya wan pê heye.
- **Xwarina piştî nîvrojê** li saet 14.30'yî. Zarokistan nanê hişk û mêweyan/fêkiyan dide zarokan.
- **Dema lîstika hundir û derve.** Di vê demê da hin endamên beşa karmendan û hin zarok vedigerin malê.
- Zarokistan di saet 16.30'yî da tê girtin. (Saeta karê rojane ya karmendan li 16.30'yî kuta dibe).

Girîng e ku hemî dayîk û bav ji bernameya mehane ya çalakiyan bi giştî agahdar bin sa ku em ji wan rewşan bi dûr bin ku tê da beriya hatina dayîk û bavan me zarokan berdînin ku bimeşin yan jî bigerin.

5.2 Anîn û birina zarokan

Zarok ê her roj were zarokistanê. Rêk û pêk bûna anîn û birinê dibe sebeb ku asteka baş a hevkarîyê nava dayîk û bavan û zarokistanê da çêbibe.

Gerek bêyî agahiya karmendên zarokistanê, zarokan nebin derve. Dayîk û bav gerek haydar bin ku karmendê/a zarokistanê yan ew kesê/a ku biryar e zarokê bibe.

5.3 Nexweşî û nehatina zarokan

Dema ku zarokek ta/teba wê, îshal/hundirketinê, verreşiyên yan jî rewşa nebaş a tenduristiyê wê heye, gerek neyê zarokistanê. Em daxwaz dikin ku dayîk û bav li ser vê yekê li Qanûnên Şaredariyê binêrin. Eger zarokek nexweş be, yan jî bi sebebên din nehatibe zarokistanê, divê zarokistan haydar be. Em ser destûrên Enstîtuya Norvêjê bo Tenduristiya Giştî dimeşin û ji we jî daxwaz dikin ku hûn jî broşûra li vê derê bixwînin: www.fhi.no li bin "Når bør barn være hjemme fra Barnehagen".

5.4 Betlane

Her sale m bo betlaneyan bi giştî bi qasî 4 hefteyan zarokistanê digirin.

Betlane bo meha July'ê 3 hefte ne û bo cejnên Krîsmes û Easter'ê(Îsterê) 5 rojên karî ne.

5.5 Cil û kinc û kel û mel

Hemî zarok bo demsala guncaw kinc, cil û berg û kel û melên wan hene. Guhertinên zêde di cil û bergan da gerek li zarokistanê bê ragirtn. Her zarokek xwedana dolaba xwe ya bi qifl û ciyekî sa cilên baranê û potînan e. **Gerek li ser hemî cil û bergan navên zarokê bê nivîsîn.**

Herdem li zarokistanê kel û melên arîkariya destpêkê(ya bijîşkiyê) hene.

5.6 Cejn girtina rojbûnan

Zarokistan wan rojbûnan cejn digire ku bo hemî zarokan wekhev in. Zaroka cejna rojbûnê dikare bo amadekariyên rojbûna xwe beşdar be. Taceka taybet didin zarokê û em li navendê bi zarokê ra cejneke li dar dixînin.

5.7 Ragirtina dirav/pereyekî biçûk

Her sal dema ku em li payîzê bi dayîk û bavên zarokan ra li Rawêjkariya Dayîk û Bavan hevdîtinan pêk tînin, em nîqaş dikin û biryar didin ku gelo em pereyekî biçûk berhev bikin yan na sa ku bikaribin xerc û mesrefa sefera zarokan bikin û wê ragirin ya na. Ev dirav û pere bo seferên kurt ên wekî Maksî-Taksî, otobûs, çûyîna şanoyê û çalakiyên wekî wan tê mesrefkirin.

6. Hevkariyên bi navend û dezgehên din ra

Bo ku em ewle bin ku zarok û dayîk û bav xwedanên xizmetên herî baş û giştalî ne ku hezkirinên herî baş ên zarokan û bo geşepêdana wan in, pêwîst e ku zarokistan bi dezgehên din ên şaredariyê û beşên din ên xizmetan ra hevkarîyê bike. Renge ev yek PPS, Navenda Tenduristiyê, Beşa Xizmetên Rihetiya Zarokan, Familiehuset û dibistanên din bin. Hevkariyên bi dezgehên û navendên din ra li bara zarokekê herdem piştî lihevkerin û hevahengiya bi dayîk û bav yan serperestan ra pêk tê. Em bi Kolêca Zanîngehê li Vestfold'ê ra hevkarên zarokistanî ne û ji xwendekarên kursa perwerdeya mamosteyên zarokistanan bo karên kirdeyî/pratîkî bi qasî salê du caran pêşwaziyê dikin.